


Kurdî
Kurmanji



Xwedê kî ye? Îsa Mesîh kî ye?

**Bersivên ji bo Dêûbavan,
Zarokan û Bawermendên Nû**

Maria T. Nagel

Who is God? Who is Jesus Christ? Answers for Parents, Kids and New Believers

Kurmanji Kurdish

Copyright © 2019 by Maria T. Nagel.

All rights reserved. No portion of this book may be reproduced, stored in a retrieval system, or transmitted in any form or by any means, except for brief quotations in printed reviews, without prior permission from the author.

Requests for information should be addressed to the author:

blessed-books@outlook.com

www.iBless.it

Text and Illustrations by Maria T. Nagel
Book conception, design and creation by Maria T. Nagel
Self-published through Blurb, Inc. 2019

Kurmanji translation by Amed Çeko Jijan.

BI KURDÎ (Zaravayê Kurmancî)

© Hoffnung und Leben e. V.

Komela Hêvî û Jijanê, 2016

All rights reserved worldwide.

DISCLAIMER

The featured images are artistic expressions of the illustrator and therefore not intended to be used as religious objects of worship or veneration.

FERAXAT

Wêneyên hatine nîşandan, derbirînen hunerî yê xêrkarê ne, û loma jî nehatine armanckirin ku wekî amûrên îbadetî û dînî yê pîrozweriyan bên bikaranîn.

The content of this book has been translated by a Kurmanji native expert translator. However, Kurmanji also called Kurmanji Kurdish is spoken in several countries such as Turkey, Syria, Iraq and Iran. Linguistic differences are therefore inevitable. Feel free to email us if you have any questions or concerns about this translation.


blessed-books@outlook.com

SÊYANE

Xwedayê me, Afirînerê bihuştê û cîhanê sê takekes e ku yek takekes e. Ev çawa çêdibe, hûn dikarin bipirsin ka ev sê takekes kî ne?

Ev in:

Xwedayê Bav
Xwedayê Kur - Îsa Mesîh
Xwedayê Ruhê Pîroz




Ji bo ravekirina vê, em sêgoşeyekê mînak bidin. Sêgoşe ji sê aliyên wekhev ku şeklekê çêdikin pêk tê.

Şeklek. Sê aliyên wekhev.

Ev wekî Xwedê ye.

Xwedayek. Sê takekesên cuda.

Xwedayên me sisê ne ku yekê pêk tînin.



Ayetên Încîlê

Bila xêra Xudan Îsa Mesîh û hezkirina Xwedê û
şirînkantiya Ruhê Pîroz bi we hemûyan re be.

(2 Korintiyên 13:14)

Niha hûn herin, hemû neteweyan bikin şagirt û wan bi
navê Bav û Kur û Ruhê Pîroz ve vaffîz bikin.

(Meta 28: 1 9)



XWEDAYÊ AFIRÎNERÊ BIHUŞTÊ Û CÎHANÊ

Xwedayê ku te û hemû tiştên ku em dibînin û nabînin afirandine, ji we pir hez dike û wî ji bo jiyana we planeke mezin heye.

Ayetên Încîlê

Kesê ku hez nake, bi Xwedê nizane;
ji ber ku Xwedê hezkirin e.

(1 Yûhena 4: 8)

Ji ber ku ez bi plana min ji we re çêkirî dizanim, dibêje Xudan. Ew ji bo xweşiyê planan dikin ne ji bo felaketê, da ku dahatûyekê û hêviyekê bidin te. (Yeremya 29:11)



ÎSA MESÎH

Xwedê Kurê xwe Îsa Mesîh şand ku me xelas bike, me fêr bike, me baş bike û nîşanê me bide ka em jî çawa bibin law û keçên Xwedê.

Ayetên Încîlê

Ji ber ku Xwedê evqas pir ji dinyayê hez kir ku, Lawê xwe yê tekane da; da ku tu kes ji yê bawerî bi wî bîne helaq nebe lê bila jiyana abadîn hebin. (Yûhena 3:16)

RUHÊ PÎROZ


Ayetên Încîlê

Ma hûn nizanin ku bedenên we perestgehên Ruhê Pîroz in,
yê di hundirê we de ye, ku we ji Xwedê wergirtiye?
(1 Korintiyan 6:19)

Lê yê Alîkar, ku ew Ruhê Pîroz e, ku Xwedê dê wî li ser navê min
bişîne, ew ê her tiştî fêrî we bike, û ew ê hemû tiştên min gotine
we li bîra we bîne.
(Yûhena 14:26)

Ez ê lava ji Bavo bikim, û ew ê Alîkarekî din bide we,
da ku Ew heta hetayê bi we re be; Ruhê rastiyê.
(Yûhena 14: 16-17)

Û bi vî awayî, Ruh jî di bêhêzbûna me de alîkariyê bi me re dike.
Ji ber ku em nizanin ka em ê çawa duayan bikin, lê belê Ruh
bixwe bi axînen nayên gotinê ji bo we şefaetê dike. Û yê ku
lêkolînan li ser dilê me dike, dizane ka fikrê Ruh çî ye; ji ber ku
Ruh li gorî xwestina Xwedê, ji bo mirovên Xwedê şefaetê dike.
(Romiyên 8: 26-27)



Ruhê Pîroz wekî Îsa Mesîh takekesek e.

Ruhê Pîroz (Xeyalê Pîroz) takekesê sêyemîn yê sêyaneyê ye.

Gava tu qebûl bikî ku li pey Îsa Mesîh biçî,

Ruhê Pîroz tê di hundirê te de dijî.


- ♥ Ew mamosteyekî dilsoz e ku beramberî çewtiyê rastiye fêrî te dike.
- ♥ Ew hevalekî mezin e ku her dem rastiye dibêje.
- ♥ Ew alîkarekî dilovan e gava xemgîn bibî alîkariye dide te ku çêtir bibî.
- ♥ Ew bi dilsozî ji te re diayan dike.

ÎNCÎL

Gotinên bihêz ên di Încîlê de peyvên
Xwedê ne.

Ew me fêr dikin ka em jiyana ku Xwedê
kêfxweş dike çawa bijîn.

Încîl her wisa çîrokên rastîn yên mêr,
jin û zarokên beriya me jiyane jî vedibêje.
Her yek ji van çîrokan di Încîlê de hatine
nivîsandin,
da ku em bikaribin ji wan fêr bibin.



Ayetên Încîlê

Hemû Nivîsên ji Xwedê ve hatine û ji bo rastiye fêrî me bikin bikêrhatî ne û nîşanî me didin ka di jiyana me de çi çewt e. Gava em çewtiyan bikin ew me rast dikin û fêrî me dikin ku em tiştên rast bikin.

(2 Tîmotêyos 3:16)



HÛN JI BO XWEDÊ BINIRX IN

Çavên Xwedê her tim li ser we ne, çimkî hûn ji
wî re pirr hêja ne.
Beriya hûn çêbin Xwedê hûn nas dikirin.

Ayetên Încîlê

Ya Xudan, te dilê min vekola
û her tiştê min dizanî.
Tu dizanî ka ez kengê rûdinim û kengê radibim.
Gava ez dûr bim jî tu hizrên min dizanî.
Gava ez rêwîtiyê dikim tu min dibînî
û gava ez li malê vedihesim.
Tu hemû tiştên ez dikim dizanî.
Tu dizanî ka ez ê çi bibêjim
beriya ez wê bibiêjim jî, Xudan.
Tu di pêşiya min de diçî û min dişopînî.
Tu destê xwe yê pîrozker didî ser serê min.
(ZEBÛR 139: 1-5)

Beriya ku ez di malzaroka diya te de dirûvê bidim te, min tu
nas dikirî. Beriya tu çêbî min tu cuda kirî û min tu wekî
pêxemberê ji miletan re peywirdar kirî. (Yeremya 1: 5)



ÎSA DIXWAZE BIBE HEVALÊ TE

Îsa ji te hez dike û dixwaze bibe hevalê te. Bi fêrbûn û kirina tiştên Îsa di Încîlê de fêr dike, em dikarin jiyaneke ku Xwedê kêfxweş bike û bi gelek awayan alîkariya kesên din dike, bijîn.

Ayetên Încîlê

Îsayî ji wî re got:

"Rê, rastî û jiyana ez im.

Heta ku ne bi navbeynkariya min be, ti kes nikare were cem Bav." (Yûhena 14: 6)

BIHÊLE BILA RONAHIYA TE BIBIRIQE

Xwedê ronahiyek xistiye nav dilê te. Bihêle bila bibiriqe.

Xwedayê ku pir ji te hez dike ronahiyek xistiye nava dilê te. Ev ronahî ji bo hindê ye ku alîkariyê bide te û yên din da ku hûn jiyaneke Xwedê kêfxweş bike bijîn. Bihêle bila ronahiya te bibiriqe û ji bo yên din bibe mînakek.

Ayetên Încîlê

Bihêlin ku ronahiya we li ser yên din bibiriqe, da ku ew karên we yên baş bibînin û şikir ji Bavê we yê li bihuştê re bikin. (Meta 5:16)



XWEDA JI MUZÎKÊ HEZ DIKE

Xwedayê me Xwedayekî kêfxweş e. Dilê wî bi kêfxweşî û kenê ve tije ye.

Ji Xwedê re bistrên. Amûrên xwe yên muzîkê ji bo Xwedê lê bidin. Ew hez dike ku hûn pesnê wî bidin.

Wî muzîk afirandiye. Hewce nake hûn bêqisûr bistrên. Hewce nake hûn bêqisûr li amûreke muzîkê jî bidin. Heke hûn bikin, pir baş e, lê heke hûn nekin, xemgîn nebin.


Wekî Key Dawid kirî ji bo Xwedê bireqisin. Hûn dikarin bi muzîkê yan jî bêyî wê bireqisin. Û heke hûn nikarin bireqisin, xem nake lewre ev ne pêşbaziyeke e, lê pêşkêşkirina hezkirinê ye ji bo Xwedê.



Bible verses

Bila bi dansê pesnê navê wî bidin
û jê re muzîkê çêkin. (ZEBÛR 149: 3)

Ho, bistrên ji bo Xudan straneke nû!
Bistrên ji bo Xudan, hemû cîhan.
Bistrên ji bo Xudan, pesnê navê wî bidin.
(ZEBÛR 96: 1-2)




XWEDÊ MILYAKET DANE WE

Hûn ji bo Xwedê gelekî girîng û binirx in,
loma wî milyaket dane we da ku we temaşe
bikin û biparêzin.



Ayetên Încîlê

Ew ê fermanê bide milyaketên xwe ku li her derê
we biparêzin. (ZEBÛR 91:11)



XWEDÊ DIPARÊZE, BAŞ DIKE Û ALÎKARIYÊ DIKE

Heke hûn xemgîn in, Xwedê dê alîkariya we bike. Heke hûn nexweş in, Xwedê wê we baş bike. Heke hûn ditirsin, Xwedê wê hêzê bide we. Heke hûn di xetereyê de ne, Xwedê dê we biparêze. Û heger pirsgirêkên we hebin, Xwedê dê alîkariya we bike.

Ayetên Încîlê

Xemgîn nebin.

Bila dilê we teng nebe. Baweriyê bi Xwedê bînin.
(Yûhena 14: 1)

Netirsin.

Netirsin, lewre ez bi we re me;
neferihin, lewre ez Xwedayê we me;
Ez ê we xurt bikim, Ez ê alîkariya we bikim,
Ez ê we biparêzim rasterast bi destê xwe yê rastê.
(Îşaya 41:10)

Xwedê hekîmê we ye.

Ew baş dike dilên şikestî
û birînên wan dipêçe.
(ZEBÛR 147: 3)

Ev pirtûka duzimanî ji bo xristiyanîyê nîşanî zarokan û bawermendên nû bide, girîng e. Xwendevan dê bi rîyeke hêsan û efsûnî bersivên pirsên wekî van wergirin: Xwedê kî ye? Îsa Mesîh kî ye? Ruhê Pîroz kî ye? Xwendevan di hemû rûpelan de dê ji wêneyên dilgerm hez bikin û dê nixê bidin gotinên pîroz yê ji bo piştgiyaya fêkirina Încîlê ya bideng.

Dêûbav, dêr, sazî û dezgehên ku dixwazin alîkariya zarokan û bawermendên nû bikin ku baweriya xwe xurt bikin, dê vê pirtûkê ji bo pirtûkxaneyê xwe girîng bibînin.

